



Schweizerische Eidgenossenschaft
Confédération suisse
Confederazione Svizzera
Confederaziun svizra

Eidgenössisches Justiz- und Polizeidepartement EJPD

Département fédéral de justice et police DFJP

Dipartimento federale di giustizia e polizia DFP

Staatssekretariat für Migration SEM

Secrétariat d'Etat aux migrations SEM

Segreteria di Stato della migrazione SEM

Kurtezanyarî

B

Penaberên pesendkirî

— Nasname B

F

Penaberên demane wergirtî

— Nasname F

F

Hilhatên wergirtî

— Nasname F



Hûn bi xêr hatin li Isviçre!

Tu kesekî penaber ê pesendkirîne, penaber ê bi demî hilanîne û yan jî kesekî bi demî hatinê hilhatin. Ji bo halê we qanunê bi taybet tên bikaranîn. Li ser vê yekê em dixwazin we bi vê pirtûkdankê agahrdar bikin.

Hûnê ji niha û şûnde bi demik dirêj jiyana xwe li Swîsre derbas bikin. Em hêvîne ku hûn bi renegekî xweş û baş tev jiyana Swîsre bibin. Ji ber vê yekê jî pir giringê ku hûn fêrî zanyariya bibin û hewelbidin xwe perwerde bikin û kar bibînin. Di vê pirtûkê de hûn dikanin têbîniyê bingehî û malpera ser navnîşanan û zanyariyan bibînin.

Em hêvîdarin ku hûn bi lez û baş di Isvicrê de çep û rûstî xwe nasbikin.

Fermangeha dewletê ya koçberiyê SEM

Ev pirtûka bi dûmenê êliktronî di vê malperê de www.sem.admin.ch bi vê zimanan tê wergirten: elmanî, firansî, îtalî, inglîzî, erebî, tigrînî, kurdî, têbîtî, farsî, temilî, somalî, sirbî/korwatî û bosnî

www.sem.admin.ch



Penaberê pesendkirî — Nasname B

B

Kesê penaber hew keseyê ê ku di welatê xwe de û yan jî di dewlatê din de, ê ku hew li cara dawiyê tê de dima, ji ber nîjada xwe, ji ber olê xwe, ji ber netewa xwe, ji ber girêda-bûna xwe bi komik sosyalî bêtê û yan jî ji ber bîr û bewariya xwe yî siyasî bi cedî zirar pê werê kirin û yan jî koçberiyik şîrovekirî habê, ku hew ê vê derd û zirarn bikşîne. Vê saloxe li bingehe didê li ser peymana penaberan a cinêvê. Weko zirarê cedî bi taybet tên hesabkirin xeterê giyanî, xeterê jiyani û yan jî xeterê li Azadiyê û her wisa tevdêrên ku zextik nefsi yê netên tehmlkirin didin. Tê rêçavkirin ku dibê jin sebebên xwe yî revê bi taybet jî hebin.

Peymana penabera misoker dikê ku çenabê ku kesikî bişînin welatekî ê tê de jan û jiyani wî kesî di xeterê da bê.

Bingeha qanunî

Rewşê qanunî a penaberan di qanuna penaberiyê de hatiyê danîn (made 58–62 AsylG/qanunê bêganana). Qanunê taze a bêganana mirov dikanê ji vê malperê bi derxîne:
www.admin.ch/ch/d/sr/c142_31.html

3

Nasnameya biyaniyan

Penaber nasnamê bêganana B werdigrin. Hew nasname ji bo salkê yê û tê dirêjkirin. Çê dibêji ku dirêjkirin netê qebûlkirin, eger sedemikî giring ji bo vê yeke hebê, weko eger ku vê kesa rewşa ewlehiyê a derva û yan jî a hindir a Isvîçre di bin xeteriyê kê. Piştî 10 salan rûniştin li Isvîçre mirov dikanê daxwaza disturdana rûniştina/iqameyî vekirî bikê û nasnameyî C (Ausweis C) werbigrê. Di tevbûna serkaftî de mirov dikanê piştî 5 salan deweyî disturdana rûniştina vekirî/Niederlassungsbewilligung bikê.

Penaberên hilanînê bi demî — Nasname F

F

Kesê penaberê ku bi demî hilhatibê hew keseyê ê ku sîfetên penaberiyê tê de habin. Lê belê hew sîfetên penaberiyê hatinê çêkirin bi rêka derketina wî ji welatê xwe û yan jî ji welatê ku hew jê hatiyê û yan jî bi sedema têkiliyê û danûhistanê wî piştî derketina wî ji welatê xwe. Dibêjî ku kesek sîfetê penaberiyê tê de habin, lê belê ji ber têkiliyê wî û danûhistanê wî mafê penaberiyê jê re nebê, bo nimone ku wî cerîmetik kiribê û yan jî hew xeter bê li ser rewşa ewlehî yê a hindir û yan jî a derva ê Swîsre. Ev kes kesna mafê penaberiyê wernagrin, lê belê hilhatinik demî li Isvîçre werdigrin.

Bingeha qanunî

Rewşê qanunî a penaberên hilanînê demî li ser bingehên peymanê penaberî a cinêfênê. Hilhatina bi demî di qanuna federasyonê de li ser kesên penaber (AuG Art. 83ff/qanunê bêganan hêjmar 83ff) hatinê şîrovekirin zelal kirin.

Di bin vê malperê de hûn dikanin qanunê taze ji qanunê federasyonê ji bo bêganan bi derxînin:

www.admin.ch/ch/d/sr/c142_20.html

Nasnameya Biyaniyan

Penaberên hilanînê demî nasnameyê F werdigrin. Hev nasname di pirtirîn ji bo 12 mihan tê derçûn û dibêjî ji aliyê kantona warê de werê ezmûnkirin û 12 miheyî din jî werê dirêjkirin. Piştî pênc salan rûniştin li Isvîçre hew kesê hilhatên demî dikanin daxwaza disturdana îqamê/Aufenthaltsbewilligung (nasname/Ausweis B) bikin. Fermangeh di femandariyê de tevîlbûnê wî, têkiliyê malbetî û dikanînbûna vegeerê welatê wî rêçavdikin.

Hilhatên bi demî — Nasname F

F

Bi demî tên hilhatin hew kes, ê ku daxwazên xweyî penaberî hatinê redkirin, lê belê cihbicihkirina derxistina wan bi çihnetê kirin. Ev rewş tê rûdan ji ber vê sê sebebnan: bi çihkirina derxistinê yan jî beredanê **ne momkînê** (bo nimone, eger pasport û yan jî kaxetê seferê nebin), **neqbûlê** (bo nimone, eger biderxistin li dijî mafê navnetewî bê) yan jî **nabê** (bo nimone, eger hew kese pir naxweş bê û li welatê wî nexweşiya wî bi rengekî baş netê dermankirin).

Bingeha qanunî

Rewşê qanunî a hilanînê demî di qanunê federasyonê li ser bêganan (AuG Art. 83ff/qanunê bêganan hêjmar 83ff) hatinê zelal kirin. Di bin vê malperê de hûn dikanin qanunê taze ji qanunê federasyonê ji bo bêganan bi derxînin:
www.admin.ch/ch/d/sr/c142_20.html

Nasnameya Bêgane

Penaberên hilanînê demî û nasnameyê F werdigrin. Hev nasname di pirtirin ji bo 12 mihan tê derçûn û dibêji ji aliyê kantona warê de werê ezmûnkirin û 12 miheyî din jî werê dirêjkirin. Piştî pênc salan rûniştin li lsviçre hew kesê hilhatên demî dikanin daxwaza disturdana îqamê/Aufenthaltsbewilligung (nasname/Ausweis B) bikin. Fermangeh di femandariyê de tevilbûnê wî, têkiliyê malbetî û dikanînbûna vegeerê welatê wî rêçavdikin.

Kurtezaniyarî û rêma

Naverok

B

Penaberên pesendkirî
— Nasname B

F

Penaberên demane wergirtî
— Nasname F

F

Hilhatên wergirtî
— Nasname F

Rûniştin

B

Penaberên pesendkirî, Penaberên hilanînê demî û hilhatên bi demî weko daxwazên penaberî ji bo kantonekî tên şandin.

F

Rûniştina wan piştî biryardana li ser daxwaza wanî penaberî li wî kantonî dimînê. Di hindirî wî kantonî de hew dikanin

F

bi serfirazî cihê xweyî rûniştinê hilbijêrin. Dibê hew navnîşana xweyî rûnistinê diyarî meqamî kanton ê berpirsiyar bikin.

Nasnameyî bêgana (sêrî jor ki) bi tenê di kantonî berpirsiyar de dimeşe.

Zanistiyên hêce ji kiriciya re bi 15 zimanan:

www.bwo.admin.ch/dokumentation/00106/00112/00121/index.html?lang=de

Çaçê kiriciyan a Isvicre: www.mieterverband.ch

Guherandina kantonan

B

Ji bo penaberên pesendkirî qanunê giştî yên biyaniyan tên bi cihanîn. Eger hew bixwazin kantonê xwe biguherin, dibê hew li cem fermangeha penaberan a kantonê ku hew dixwaznin herinê, daxwaznameyê hildin. Daxwazname bi tenê tê redkirin, eger hew kesê daxwazê hildidê bêkar bê û yan jî sedemikî derewandinê hebê.

7

F

Penaberên hilanînê demî dikanin daxwazê guherandina kantonê hildin. Daxwaz dibê werê redkirin, eger hew kese bêkar bê û yan jî sedemekî dere-wandinê hebê. Daxwaza guherandinê kantonê dibê yekser li cem SEM werê hildan.

F

Hilhatên wergirtî dikanin bi tenê daxwaza guhertina yek kantonê bikin. Ev daxwaz rasterast bigihînin SEM. SEM wê li benda bersiva Kantona hatî xwestin bike û di pey re biryarê li ser wê bikarhate werbigire. Ev tenê pêk têt, eger mafê jiyana malbatî hebe, metirsiyê mezî liberçav be an jî her dû Kanton bi guherandinê razî bin.

Rêwîtiyê dervayî welêt

B
F

penaberên pesendkirî dikanin li cem fermangeha penaberan di kantonê xwe de daxwaza paseporta penaberan hildin.

Bi vê paseportê hûn dikanin herin dervayî welêt û cakdin jî vegerin Isvîcre. Ji bo vê yekê dibê hûn bi xwe herin cem fermangehê. paseport ji SEM derdiçê û bi giştî ji bo 5 salanê.

Haydan: Eger penaberek pesendkirî an jî yekî demkî hatibe wergirtin vegeê welatê xwe, çêdibê ku sîfete penaberiyê ji wî werin kişandin.

F

Penaberên bi demî hatî wergirtin, nikarin serbest geştê bikin. Pêdivî ye, passportên xwe yê welêt deynin ba SMS.

Di bin mercên zor de (eger zor nexwê be an li mirina hinek ji endamên malbata wî), dikare bi xwe biçe nik karmendên nivîs-geha penaberan ya Kantona lê û daxwaza Vîza vegeê bike. Ew mirov ê, imkan nîne, passporta welatê xwe peyda bike, dikare daxwaza ji bo kesekî bêgane bixwazin, ku geştê sanahî bike. Ev rêma 10 heyvan heye û tenê rêdan pê tete dan, bes tenê bo seferê bikar bihêt.

Hanîna malbetê

B

penaberên pesendkirî dikanin malbetê xwe (jin û mêrê xwe, hevalê xwe ê tomakirî û zarokê xwe ê di bin 18 saliyê re) hûnin cem xwe Isviçre. Hew jî weko penaber tên pesendkirin û mafê penaberî werdigrin, eger çi rewşeke taybet li dijî vê yekê rû nede.

Zarokên penaberên pesendkirî ê ku li Isviçre çêbûnê ji xwe berê mafê penaberiyê pesendkirî wernagrin. Ji ber wê yekê jî dibê bi lez li piştî çêbûna zarokan daxwaznameyî penaberiyê li cem SEM werê hildin, ta ku zarok jî mafê penaberiyê werbigrê.

F
F

Penaberên hilanînê demî û hilhatên bi demî dikanin bi zûtirîn piştî 3 salan li hilhatina demî li cem fermangeha penaberiyê a kantonê daxwaza hatina malbetên xwe bikin. Hew dikanin bi tenê jin û mêrê xwe û zarokên bi çûk (û nezewicî) hûnin. Merc û şertê malbethanînê hewê ku malbet bi hev re jiyane bikê û rûnin, xanê bes mezin bê û malbet bi xwe xizmetî xwe yî madi bikê (ne girêdayî alikariyê sosyalî bê).

Hatina malbetê dibê di navberê 5 salan de werê kirin. Ji bo zarokên di ser 12 saliyê re dibê daxwazname bi derengtirîn piştî 12 mihan werê rakirin/hildan.

tevlêbûn

B
F
F

Kesê ku bi dirêjî li Isviçre dijî, dibê xwe li gorî îmkanê bi lez tevî civakê û tevbûnê bikê. Em li bendê ne ku penaber çi jin û çî mêr xwe hişyarî zanebûnê ser vê babetê bikin û hewil bikin, zimanê hirêmê bixwînin, kar bikin û beşdarî jiyana sosyal bibin. Welatê Isviçre alikariya pêvajoya tevlêbûnê bi bernaman û bi projeyan dikê û hewil didê, ku her kesik wekhevdi wê şansê bigrê. Armanç hewê ku hemu nixê distura federasyonê werin hurrmetkirin û ku em li Isviçre bi hurmet û rêz bi hev re bi sax û bi aşitî bijîn.

Zanyarê zêde li ser politika tevlêbûnê a Isviçre:

www.sem.admin.ch/bfm/de/home/themen/integration.html

Alikariyê tevlêbûnê

B
F
F

Gelek rêxistinê dewletê û yên taybet kursan û pêşnihatan pêşnihat dikin, ta ku penaberên pe-sendkirî û penaberên hilanînê demî û hilhatên bi demî di pêvajoya tevbûnê de li Isviçre alikariyê wergirin. Şîreta bo xwe bistînin û wan bi cedî werbigrin! Hûn dikanin zanyariyê zêdetir li merkezên zanîdar yên tevlêbûnê û yan jî li cihên tevlêbûnê yên kantonan werbigrin.

Zeniyariyên zêdetir li ser Palpiştîyên tevlêbûnê:

www.sem.admin.ch/bfm/de/home/themen/integration/foerderung.html

Dibistan

B
F

Zarokên penaberên pesendkirî û yên penaberên hilanînê demî dikanin û pêdivî ye weko hemu zarokên din ê li Isvicre dijîn biçin dibistanê û xwe hîn bikin. Hew diçin beşxê zarokan û 9 salan jî diçin dibistana mecbûr. Piştî wê ew dikanin li gorî îmkaniyetên wan perwerdekî zanetî bikin û yan jî biçin dibistana amedikirinê ji bo xwandina dibistana bilind/universîtê.

F

Zarokên kesê hilhatên demi dikanin herin beşxê zarokan û 9 salan jî biçin dibistana mecbûr. Ketina perwerdê zanetî û dibistana amedikirinê ji bo dibistana bi-lind/Universîtê û xwandina dibistana bilind bi xwe li ser her kantonekî dimî.

Zenyariyê zêdetir li ser mijarê dibistanê û çûndina perwerdê:
www.ch.ch/private/00060/00062/index.html?lang=de
www.berufsbildung.ch

Perwerdeyê zêdetir

B
F
F

Li bazara kar a Swîsre xastekê bilind ji karkiran tên xwestin, weko ji bo nimone kanînê û qudretê zimanî û mîhenî. Pir caran kêrbûna bêganan çî jin û çî mêr ne li gorî xastekê sûkê kar û îsên û yan jî derçûnnameyên wanî xwandinê ê li dervayî welêt netên pesendkirin. Kursên zimên, perwerdekeyên zêdetir û yan jî pêşnîhatên din alikariyê didin, ku mirov têkevê jiyana kar û îş. Di merkezên bersivdar de yên tevlêdûnê û di cihên bersivdar de yên kantonî mirov dikanê zanyariyên girîng û şewirmendiyan werbigrê.

Navnîşanên cihên şewirmendiyanî bersivdar li ser zanetî di kantonan de: www.kbsb.ch/dyn/19622.php

Kar

B Ji bo Penaberên pesendkirî û penaberên hilanînê demî heta ku têkevên kar û îş disturdanik pêwîstê. Ev destûrdan jî ji alî xwudiyê kar de li cem fermangeha kantonî a berpirsiyar tê daxwazkirin.

F Kar û îş kirin dibê bi tenê pişti wergirtina disturdana werê kirin. Fermangeh vê disturdanê bi vê yekê ve girêdidin, ta ku miaş û ratib û şert û mercê kar û îş werin parastin. Bi vî rengî mirov dixwazê penaberan û penaberên hilanînê demî û hilhatinê demî weko karkir biparêzê û nêlibê ku hew bi tarîfê hindiktir ji kesê din kar û îş bikin.

B Penaber û penaberên hilanînê demî dikanin têkevin sûka kar û îş bêyî sînorkirinê di kantona xwe de û dikanin di hemu mijarên aborî de kar û îş bikin. Divê ew ji bo dîtina karekî xwe biwestînin.

F hew kesên bi demî hilhatinê demî dikanên ji fermangehê kantonê bê girêdana sûkê kar û îş û bê girêdana rewşa aborî disturê ji bo kar û îş wergirin.

Hemî tişt li ser mijarê kar û îş û li ser lêgerînê kar û îş:

www.treffpunkt-arbeit.ch

Zanyariyên li ser îşkar û karkir:

www.ch.ch/private/00054/00055/index.html?lang=de

Tenduristî

B
F
F

Swîsre xizmeteke baş ya tendurustî û saxlemiyê pêşkêş dike. Xwe agahdar bikin, çuna hûn û malbeta we dikanin bi tenduristiyek baş bijîn û çî pêşnîhat henê.

Hemu kesên li Isvîçre dijîn mecbûrin sîgorta xwe yî tenduristiyê a bingehî li cem sindoqa nexweşan peyman bikên – zarok jî.

Û her wisa jî di mijarî tenduristiyê de giringê ku hûn li gorî îmkaniyetê bi rengikî baş bi zimanê dewletê têbigên û fehim bikin.

Fermangeha federasyonê ji bo tenduristiyê zanyariyên fereh ji bo diyarkirinê û dermankirina nexweşiyên giyanî û nefsi bi gelek zimanan pêşkêş û pêşnîhat dikê.: www.migesplus.ch

**Xaça sor a Isvîçre SRK xizmetên xweyî alîkarî ji bo dermankirinê û ji bo dermankirina nefsi û ji bo şewirmendiyê li Bern, Zurîx, cinêfê û li luzanê ji bo qurbanên îşkanjê û şer û ji bo mirovên wan pêşkêş dikê:
www.redcross.ch/de/organisation/ambulatorium-fuer-folter-und-kriegsopfer/hilfe-fuer-traumatisierte-menschen**

Merkezî nexwesiyên nefsi GRAVITA xizmetî xwe li St. Gallen ji bo qurbanên îşkanjê û şer û ji bo mirovên wan di nexweşiyên nefsi û şewirmendiyê de pêşkêş dikê: www.gravita.ch/angebot/

Sîgortên sosyalî

B
F
F

Li Isviçre şebekak baş û fereh a sîgorta sosyalî heyê. Wek penaberekî pesendkirî, penabe-rekî hilanînê demî û kesê hilhatên demî hûn weko xelkî Isviçrî baş hatinê sigortekirin. Sîgortên sosyalî alîkariyê didin, eger kesek bêkar bibê û yan jî seqet bibê. Ji bo kesên emirdar teqawitîk tê dan. Jinên karkir bînvedana peredayî di hemlê de distînin. Di mirinê jin û yan jî mêr de jî û yan jî di mirinê de yik û bavê de jî (ji bo kesê temen zarok) teqawitîkê distînin. Eger ku tu bi kar bê, tu sîgortên sosyalî bi parekî sabit bi xwe didê (parikî sabit ji mîaş jê tê wergirtin). Kesên karkir di rêya xwediyê kar re li dijî qeza û nexweşiyên ji kar û îş tê pêdakirin tên sîgorte kirin.

Zanyarên zêdetir li ser sîgortên sosyalî:

www.bsv.admin.ch/themen/index.html?lang=de

Li ser sîgorta bêkarî:

www.treffpunkt-arbeit.ch/arbeitslos/erste_schritte

Li ser sîgortên din:

www.ch.ch/private/00029/00039/index.html?lang=de

Baç û dandinê bi taybet

14

B
F
F

Penaberekî pesendkirî, penaberekî hilanînê bi demî û kesê hilhatên demî dibên li Isviçre derîbeyan bidin. Hew tên bacekirin li gorî kaniyê bacan, yanê berdankên bacan yekser ji mîaş ê tên birîn (bandî 83 heta 110 ji qanûnê federasyonê li ser bacên yekserî ê federasyonê). Zêdekirina bacan dibê werê guherandin ji kantonekî heta kantonekî.

F

Hilhatên bi demî, ê ku kar û îş dikin, dibê bêyî bacên normal ji bo sîgortên sosyalî, bacên bi taybet jî bidin. Hew baçenan ji alî xwediyê kar ve yekser ji mîaşê tên kişandin û tê şandin ji bo fermageha deweletê a ji bo penaberiyê. Bilindbûna vê bacên bi taybet li gorî 10 ji sediyê ê mîaşê bê birîn.

Mecbûrdayîna baçên bi taybet piştî 3 salan ji hilhatê bi demî, bi derengtirîn piştî heft salan ji ketina Isviçre de û yan jî ku berdank gihîşte 15000 frank, tê bi dawî kirin.

Palê zanyariyê bi zanistiyên zêdetir li ser bacedanê macbûr û bi taybet ji alî fermangeha de-weletê de a ji bo penaberiyê tê li derxistin:

www.sem.admin.ch/bfm/de/home/asyl/sonderabgabe.html

Alîkariya sosyalî

B
F

Heqê penaberên pesendkirî û penaberên hilanînê bi demî li ser alîkariya sosyalî wekî heqê xelkî Isviçriyê, eger ku hew nikanibin, bi xwe ji bo xwe wemê xwe bixwin.

F

heqê hilhatên bi demî jî li ser alîkariya sosyalî bi kantonî tèn birêxistin. Bi rengikî bingehî qanunê di madeyî 80–84 ji qanunê penaberan ji bo penaberan tèn bi karanîn (madeyî 86 ji qanunê bêganana), ê ku di hinik kantonan de kûrtirîn ji qanunê li ser penaberên pesendkirî û penaberên hilanînê bi demî.

15

B
F
F

Alîkariya sosyalî ji perê bacanê. Bilindbûna alîkariyê sosyalî çêdibê ji kantonekî heta kantonekî cuda bê. Lê belê di gelek kantonan de qanun li ser hesabkirina alîkariyê sosyalî tê bi karanîn, hew qanunê ku ji konfirênsi Isviçre de li ser alîkariyê sosyalî (SKOS) hatiyê tesbîtkirin. Bi vê yekê jî alîkariyik adil û mezbût û cihkirtî li Isviçre hatiyê misokerkirin.

Zanyariyê din di bin vê navnîşanê da nê:

<http://skos.ch/sozialhilfe-und-praxis/haeufig-gestellte-fragen>

Hêvî ji hemî kes ên dikarin kar bikin, tête kirin, ku xwe ji alîkariya nivîsgeha civakî bêpar bikin û bi xwe, xwe û malbata xwe bikaribin xudan bikin

Navnîşanê giring

Fermangeha kantonî a penaberiye û kar û îş:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/
kantonale_behoerden/adressen_kantone_und.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/adressen_kantone_und.html)

Fermangeha kantonî a wetendaşiyê:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/
kantonale_behoerden/kantonale_einbuengerungsbehoerden.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/kantonale_einbuengerungsbehoerden.html)

Fermangeha kantonî a nifûsê:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/
kantonale_behoerden/Adressen_Meldeverfahren.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/Adressen_Meldeverfahren.html)

Cihên denglêkirinê ji bo tevlêbûnê di kanton û bajarên de:

[www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/
kantonale_behoerden/kantonale_ansprechstellen.html](http://www.sem.admin.ch/bfm/de/home/ueberuns/kontakt/kantonale_behoerden/kantonale_ansprechstellen.html)

Malperê din ê bi fêde

Fermangehên Isviçre online:

www.ch.ch

Fermangehê çapkariyê dewletê ji bo penaberiye SEM:

www.sem.admin.ch

Komisyona sûndarî a ji bo pirsên penaberiye EKM:


www.ekm.admin.ch

16

Berpirsiyarî

Derker	Staatssekretariat für Migration SEM Quellenweg 6, CH-3003 Bern Wabern
Nivîsgeha derhênanê	Information und Kommunikation, SEM
Grafik	meierkolb, Luzern
Wênesazî	Fabian Biasio, Luzern
Jêder	BBL, Vertrieb Bundespublikationen CH-3003 Bern www.bundespublikationen.admin.ch





Ev pirtûka bi dîmenê êliktronî di vê malperê de
www.sem.admin.ch bi vê zîmanan tê wergîrtin: elmanî, firansî,
îtalî, înglîzî, erebî, tigrînî, kurdî, têbîtî, farsî, temilî, somalî,
sîrbî/korwatî û bosnî

www.sem.admin.ch